Rast e li Başûr bûn bi du rêber, lê xelkê Başûr pê ve girêdayî bûn, û roja herdu gihîştin rêkeftinekê, ketne ser riya serketinê. Li ser vê rastiyê, bê guman, her çi zirar dighêje Kurdistana Sûrî, Apo û Berzanî vî barî hildigrin, û dikevine ciyê guman û pirsê û berpirsiyariyê.

Sînor Bi Xwînê Li Sûriya Tên Danîn

Salar Salih

Cenga li ser bingehên tîreyî berdewam e, û sînor bi xwînê tên danîn li ser xaka Sûriya, rast e di destpêkê de şoreşa miletekî li dijî rêjîmek diktator bû, lê piştî salekê ji destpêka raperîna 15ê Adarê hat diyarkirin ji çavdêran re naveroka pirojeyê tîreyî yê rikberiya Sûrî ya çekdar, renge ku ew rikberî bi heman şêweyî miletê kurd wek netewek xwedî hebûn û maf di Sûriya de napijirîne, tenê mafê welatiyan ji Kurdan re heye, wek welatiyekî di Sûriya ya Erebî de, ango piştî pênc salan ji berdewamiya şer li Sûriya, rikberiya Sûrî nikarîbû projeyekî siyasî tewaw ji Sûriya ya nû re pêşkêş bike, ku tê de mafê hemû pêkhateyan parastî be. bi encama Şerê ku li Sûriya tê gerandin li ser bingehên tîreyî û nasnameya neteweyî , niha Sûriya di navbera pênc hêzên sereke de parve bûye,(rêjîm, artêşa azad, H.S.D , Daiş û Nusra), ev bixwe tê wateya parçekirina Sûriya li ser bingehên tîreyî û neteweyî, sînor di nav her sê pêkhateyên Sûriya yên sereke de (Kurd, Elewî, Sunne) niha bi xwînê tên nîgarkirin, û ev temez di Sûriya nû de wê bête çespandin jiber du sedemên serekî : 1- Parçebûna Sûriya bi destên pêkhateyên wê dikeve berjewendiya Amêrka û Isra'îl ê de, jiber ku ew naxwazin desthilatek sunnî radîkalî navendî li Sûriya ava bibe, ku wê gefek metirsîdar be li ser Isra'îl ê, û herweha dê gefê li Amêrka û berjewendiyên wê li navçeya Rojhilata Navîn bike, Obama piştî giha wê baweriyê ku hevalbendên wî yên Sunnî (Turkiya, û deweletên kendava Erebî) ew piştgirên sereke ne ji tîrorê re, û komên çete yên ku (El-selefiye El-cîhdiye) wek bîrdozî û bawerî ji xwe re bijartine mîna (ketîbeyên îslamî,Cebhet El-Nusra, û Daiş), ewî bi diplomasiyet û tektîk hêza Suuna li herêmê lawaz kir, bi rêkeftina newewî li gel Îranê careke dî rola Îranê di herêmê de xurt bû wek dijberê sereke ji Suuna re, ya dî jî Amêrka destê Rûsiya di Sûriya de berda da ku bi tundî li girûpên rikberiya Sûrî bixe û rikberiya Sunnî ya li Sûriya lawaz bike, û di heman demê de Rêjîma ku li ser bingeha tîreya Elewî hatiye avakirin biparêze ji rûxandinê li ser destê opozisyonê, ev pilan Obama bikaranî da ku berjewendiyên xwe yên aborî bi dewletên Sunnî re ji dest nede, û rola sînordanîna hêza Sunnî li Rojhilata Navîn sipart Rûsiya û Îran ê. 2- piştî vî şerê giran li Sûriya û hejmara mezin ya goriyan û penaberan, ne Elewî û ne Sunne û ne Kurd jî êdî çekan datînin, sê hêzên leşkerî yên cuda li Sûriya ava bûne, ew hêzên ku civaka navdewletî ew pijirandine û danûstandinan ligel wan dikin,(Rêjîm, Rikberî, H.S.D), sînor bi xwînê niha tên nîgarkirin, û Sûriya tucarî hew vedgere wek berê û ber bi formê Îraqî ve diçe, sîstemek fîdral an konfîdral an parçebûn, ango bi hevokek din, pêkhateyên Sûriya pêkvejiyanê hew dipijrînin. Ev projê ku tê bicîkirin li ser xaka Sûriya, Elewiyan nas kiriye û pê razî ne, Sunne nas kirine lê ew pê nerazî ne û ta hêza wan hebe wê şer bikin, lê Kurdan hîn ev proje baş nexwendine, jiber Kurd belawela ne di navbera kiwalisyon û hevrêziyê de, bê proje û bê giranî, ger baş qunaxa tê bixwînin gerek frakisyonek Kurdî rikber bi-afirînin û dev ji çarçev in rikberiya Sunnî û ya çep berdin, wek pekhateya Kurdî tevbigerin, wek çawa hevbendiya Kurdistanî li Îraqê wek frakisyonek rikber ya serbixwe tevdigeriya bo dabînkirina mafên milletê Kurd, ev derfeta dîrokî her sed salî carekê tê, lewre gerek e E.N.K.S û TEVDEM ê li xwe vegerin û li berjewendiya milletê xwe bigerin, û frakisyonek yekbûyî ava bikin, û têkevin danûstandinên çareseriyê ligel rikberiya Sunnî re bi Rêjîma Sûrî ya (Elewî) re.

Piştî Sed Salî Ji Saykis Pîko

Idrîs Hiso

Sed sal di ser rêkeftina Sayks Pîko re derbas bû, kurd vê rêkeftinê bi xemgînî bibîr tînin, piştî ku zilhêzên cîhanê wê demê nexeşeyên Rojhilata Navîn danîn, Kurd ji vê dabeşkirinê bê pişk man û welatê wan bû para dagîrkeran, bi tenê Kurd wek miletekî mezin di bin dagîrkera Ereb, Tirk û Farisan de man.

Kurdan piştî ku bi bizavên siyasî nema tiştek bidest xistin û piştî ku sînorê dewleta nû ya Tirkiyê hat nexişandin û Kurd di hindirê wê de bûn wek kole û bindest û ji hemû mafên xwe bê par man. Dest bi xebata çekdarî kirin, şoreş li pey şoreşê lidarxistin. Lê mixabin şoreşên Kurdan bi taybet li Bakur û Rojhilatê Kurdistanê ti encamên rijd bidestnexistin. Tevgera rizgariya Kurdî di xebata xwe ya siyasî de, ji bo hişyarkirina gelê Kurd û şirovekirina sedem û fakterên têkçûna şoreşên Kurdî, herwiha sedem û fakterên nebidestxistina mafên siyasî bi gelek şêweyan şirove dikirin.

Gelek ji rêxistin û partiyên Kurdî (Partiyên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê wek nimûne) bi tenê li aliyekî vê têkçûna Kurdan dinerîn û bo me ew şirove dikirin, herwiha heta niha jî gelek rêxistin bi heman şêwe û ramanê wan tiştan didin ber şiroveyê.

Dijminan Em Jihev Xistin

Herdemê partî û rêxistinên Kurdî bal dikişandin ser wê yekê ku bi tenê sedem ew bû ku Tirkan nexwestiye dewleta me çêbibe, Hikûmetên Tirkiyê zordar in û Zilhêzên cîhanê hemû li dijî daxwaz û mafê Kurdan e û dewletên Ereb, Tirk û Farisan me binpê dikin û mafên me dixwin...hd, yê nizane wê bêje qey heger ev sedem nebûna, civata Kurdî û Kurdistanî civatek bê kêş e û girift in!. Bi vî şêweyî bi tenê xort û keçên kurdan digihandin wê asta bê hêviyê. Ku ewqas dijmin mezin e, ewqasî rewşa me jî xirab e ..êdî em dê çi bikin...?! nerîna li kêşeyê bi vî hawî tenê pirsgirêkek mezin bû û mezin e.

Partî û rêxistinên Kurdan bi tenê loma xwe li dijminê xwe dikirin û heta niha jî dikin, ma dijminek li cîhanê heye ku rojek bê û bêje li min biborînin ez zalim bûm êdî kerem bikin mafê xwe bibin?!!

Bi vî şêweyî rêxistinên Kurd bi tenê li çekên di dest dijminên xwe de dinerîn, lê çi çekên di destê wan de ye wan nizanî, an jî jibilî kêşe û astengiyên ku dijiminê wan li dijî pêşveçûna Kurdan datîne. Civata Kurdî bi xwe pêwîstî çi ye heta ku bibe civatek xwedî hestê neteweyî?!. dibe ku ev pirs ji xwe nedikirin an jî heger ev pirs dikirin çare û bersiva zanistî û civakî nizanîbûn, an jî heger zanîbûn bi wêrekî û eşker ji gel re nedigotin û riyên guncaw bo xebatê li ser wan bingehan peyda nedikirin.

Têkoşînek Bê Hemba Li Dijî Nakokiyên Nav Kurdan Pêwîst e

Wek mînak wan sibê heta êvarê digotin; em ji bo mafê ziman û kelûtra Kurdî xebatê dikin, beramberî vê gotinê jî heta bi raportên xwe yên rêxstinî bi zimanê Fermî yê Dewletê dinvîsîn. Her tiştên xwe ne bi kurdî dikirin, gelek ji serkirde û sekreterên partiyên Kurdî û Kurdistanî li gel miletê Kurd jî bi ziman û şêweyê dagîrkeran diaxivîn û heta roja îro diaxivin û bayexê nadin zimanê xwe, ku ew bi xwe (Ziman) fakterê serekî yê hebûna û mana miletên blindest in. Rojname û peyamên xwe ji bo gelê xwe jî her bi zimanê fermî yê dewleta dagîrker radihandin û heta roja îro jî radighînin.

Herwiha yek car an gelekî kêm li ser kêşe û pirsgirêkên civaka Kurdî radiwestiyan û sedemên civakî ku yek ji girîngtirîn sedemên têkçûna soreş û bizavên kurî bûn behs nedikirin, hewla guhertina civakê nedidan, an jî bi xurtî nikarîbûn li ber nerîtî û kêmasiyên civakê xebatê bikin.

Ev alî bi xwe pêwîstî têkoşînek berdewame di aliyê civakî û siyasî de, ku xelk pêwîsî wê yekê ne ku rastiya doxeya civatê bo wan were gotin, bi taybet serkirde û kadirên çalak di rêxistin û civatê de, da ku bizanibin kêşe çi ye û çi cûre xebat û têkoşîn pê gerek û li ser van zaniyariyan plan û bernameyên xwe pêk bînin.

Kurd Li Ser Gelek Xalên Bingehîn Nakok in

Di civata Kurdî de zor kêşe û pirsgirêk hebûn û hîna hene, ev kêşe û pirsgirêk mirov wan kêm di nav miletekî bindest de dibîne, ji wan kêşeya nebûna ziman û elfebeyek yekgirtî li seranserî Kurdistanê ku, ev babet bi serê xwe pêwîstî têkoşînek gewreye. Nebûna alayekê ku nûnertiya gelê Kurdistanê li ser asta cîhanê bike, ew alaya li Herêma Kurdistanê tête bilindkirin, tevî ku li seranserî Kurdistanê û cîhanê wek alaya Kurdistanê tê nasîn, lê hin rêxistin û partiyên Kurdistanî bi taybet partî û rêxistinên ser bi Partiya Karkirên Kurdistanê (PKK) an jî rêxistinên ku li ser felsefe û îdiyolciya PKKê û hatine avakirin wê wek alaya Kurdistanê nabînin û dibêjin ew bi tenê alaya Başûrê Kurdistanê ye.

Herwiha nebûna nûnertiyek an jî parlemenekî ku nûnertiya Kurdan li seranserî Kurdistan û cîhanê bike, divê ev parlemen nûnerê herçar perçeyên Kurdistnê herwiha nûnerê Kurdên li derî Kurdistanê dijîn li xwe bigre da ku karibe pirsgirêka Kurd li seranserî cîhanê wek yek dose û pirsgirêk bighînin raya giştî ya cîhanî.

û gelek xalên din ku yek ji sedemên lawazbûna tevgera civak û rêxistinê Kurd û Kurdistanê ne.

dawî gotin mirov dikare bibeje tevî derbasbûna sed salî di ser pirsgirêk û doza gelê Kurd û Kurdistanê re, hîna jî civata kurdî di gelek aliyên xwe de pêwîstî têkoşîn û xebatek şaristanî û li ser bingehên zanistî û civakî ye.

Kesnezan 10.01.2016

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Birawo .. Yê Koçber Ez Im..!

5-5

Silêman Azer

Tu dibe windayek di kolanên Sitembolê de,tu bêhêvî dibe bi derbasbûna rojan re,lewma tu demên xwe bi gera kolanan dibûrîne. Şevên te bidawî nabin û tu bendewarê çareyekê yî,rêberê te pasporteke sextet ji te re peyda dike piştî ku tu jêre dibêje ku pasporta Sûrî bi te re nîne. Piştî şevekê ji windabûnê di kolanên bajar de tu vedigere xanî,û ristika bêrîkirin û tenêbûnê zora hêvî û aramiya te dibin,tu dixwaze kêlîkan bi dengê zarokên xwe biperçiqîne û kulîlkên hêviyên xwe bi kenê wan av bide,lê tu ji xwe diwerive dema zaroka te yî biçûk dibêje:Yabo tu dizane çima ta niha tu ji wir demeketiye tevî her roj bi sedan mirov derdikevin,çima keçka min,û bi wê bêgunehiya xwe bersiva te dide :Ji gunehê bavê min hecî û diya min heciyê ye ji ber te dev ji wan berda û hîna dilê wan ji te maye û erê biserê lêvan dibêjin Xweda oxira wî hilîne lê dihundirê xwe de ne bidilê wan bû çûna te,gotinên wê agirê di dilê te de gur dike û ew agir ava deryaya spî bicarekê li peravên Sitembolê dikelîne,tu nikare ji şevê bireve û bi qîjekê pêsîra bêdengiyê biçirîne,lewra tu li xwe tê hev û dibe gulokek ku ew cih te li newalên xwe digindirînin,berî ku xilmaşî çavên te gerim bikin tu hest dibe ku kesek te şiyar dike û dengê wî dikeve guhên te de:polîs…polîs rabe ser xwe. Tu di wê rastiyê de yî ku ev ne xewneke ne xweş bû piştî wê şeva kovandar û tûj ku di damarên tenêbûna te re diçûn,tu li vir hatî girtin,destên te û rêberê te bi hev re kelebçe dikin û berê we didin navenda polîsan.gelek pirsan ji te dikin û li kesekî ku tu nas nake jî dipirsin:ka filan kes,çima tu li mala wî yî heger tu wî nas nake,tu hatiye vir çi,tu çawa hatî û benên pirsan dirêj dibe. Piştî tu rojekê li wir derbas dike te serbest berdidin û ew pasporta te yî sexte jî bi gelek pasport û nasname û mohrên sextet re jî dice,û bi rêde yê rêber te agahdar dike ku xanî ne li ser navê wiye lê li ser navê kur xalê wiye,û tu dighêje wê baweriyê ku xwediyê wî xanî gelek fen û fûtên wî hene ji lewma polîs lê digerin. Bêhêviyeke dîtir xwe di kêlîkên te de diçikilîne ji ber wilo divabû tu biryarekê bide û xwe ji geravên dudiliyê rizgar bike,ew riya ku te dixwest bide ser bicarekê hate girtin nexasim piştî ew pasporta sixte dest danîn ser,bêguman derketin di riya firokgeha Sitembolê re zor bû,û tu çareyên dîtir li pêşiya te neman ji xeynî riya daristan û rêbiwariyê,û te ev biryar ji rêberê xwe re eşkere kir,de vêce ka ez te bibînim ka riyek baş ji min re bibîne.

Sibatoka Dînik

Bavê Serbest

Di toreya Kurdî de gelek mînak û pend li ser meha sibatê hatine axavtin. Çawa piraniya rojên wê tersî hev tên.
Hin germin hin jî sarin, hin sayîne hin jî bi mij û dûman in, hin bi tav û birûskin, hin bê deng in. Gelek bobelat û firtone û xeşmên xurustê di vê mehê de qewimîne wek efsana (ENTER kurê ŞEDAD) û (PÎRA BI DEK). Kurdan reş meh bi nav dikirin û digotin. Sibat qirimqat, kevin çû nû nehat.
Ji ber êmîşê ku di meha havînê de amadakiribûn ji bastêq , mewîj , hejîr , û goştê dermala yê kesidandî û pêdivyên jiyanê û taybetî çêra pez ya çolî ew jî kêm dibû çawa Sibat bêndera berfê bû pûş û pelax û giyayê ser zemînê ew jî di bin berfê de dima. Û hatiye gotin mêrko wek sibatoka dînike, geh sare geh germe, haşîtiya wî buhare û bîntengiya wî jî are û digotin:

keç meyroka şikakî
kofiya wê ji bare gakî
her katekî bi awakî
Û di efsaneyên Kurdande dibêjin dema sibat buhurî pîrê mûyê hersê bizinê xwe birîn û got:
sibat hat û buhurî
min kuçek li nav serî kirî
tişt bi biznê min nekirî
Dema sibatê ev salox ji pîrê bihîst, pir lê nexweş hat. berê xwe da meha adarê, û got:
xwaka adarê
bid min Sêro xedarê
ezê biznê pîrê ji şikêran bînim xwarê.
Adarê daxwaza sibatê pêk anî û bû berf û bahoz serma û seqem. bizinê nû birî tevde mirin ji serma. paşê xurust xêzî vêzî hev bû, serma çû, xêr û bêra adarê dest pê kir. geya, nefel û çîçek şîn hat. xunc li dar û deviyan xuya kirin. Pîrê li nava beharê gerya, geh di ponije, geh jî di kene
çendî xweşe ev buhar
di bişkivin devî dar
vê demsala buharê
pîrê jê maye bê par
***
forta min, bû nezanî
bê sûde ye poşmanî
zirta mezinî dijwar
bo min anî xizanî
***
bizinê min tevde kuştin
nav şikêran heriştin
dûmahîka sibat ê
koda min vala hiştin
***
adar dibe nû buhar
di bişkivin gulhinar
mehreşke ev sibatok
şemitî pîra hejar
***
vê sibata dîn û har
mandû kirim birîndar
guharek kir guhê min
nema ez lê di dim dar
***
Bêgûman dost û zikêşên kurdan dibêjin raste, kurd mêrin çeleng in, lê mêraniya wan ket bin berjewendiyên biyaniyan û neyar pir sûd jê wergirtin. geh bi bihana biratiya busulmanan, geh jî bi navê aşîtiyê,wek heviyê di bin van siloganên vala de.
Welatê me ma dagirker destelat, em jî bûn dîl û perîşan.
Bi hizir û baweryê min dem hatiye ku em ji neyarê derewîn bawer ne kin û lê bibin sibatoka dînik, bizinê wî ji şikêra bînin xwarê.

Sipas ji bo rojnama buyer û wefadarya wê ku hîn em jibîr nekirine.

Êrîşên Dîrokî Berdewam in

Şêrko Ebdulrehman

Carcaran pêwîst e mirov hizir bike û rê li pêşiya vekolîna baweriyên xwe yên rûnîştî; veke. Çimkî ti kes şareza ji dayik nabe. Her wiha raman û baweriyên di mêjiyê me de rûnîştî û cihê xwe girtiye ne tam rast in! Ev gotin bi taybet ji bo kesên ta roja îro pesnê kujerên bav û bapîrên xwe dikin! Ev gotin arasteyî kesên ku rastiyan berovajî dikin, bi taybet jî yên weke rewşenbîr xwe didin nasîn. Ew kes xwedî erkên giran in, lewma ez gotinên xwe arasteyî wan dikim. Hê jî mirov û rewşenbîr di civaka Kurdistanî de hene rastiyan berovajî pêşkêşî gelê xwe dikin, û tiştan bi nav nakin an jî navên bûyeran diguherin. Weke mînak; tu kes - ne rewşenbîr ne zagonsaz- bi awayekî fermî komkujiyên ku bi serê Kurdan de hatine, pênase nake. Mixabin komkujî û kujer ta roja îro berdewam e û berpirsyarê wê ji hêla neviyan tên pesinkirin!! Beriya 1400 salî êrîşên hovane li ser gelên herêma Mezopotamyayê pêk hat, şaristanî hate rûxandin, zilam hatin kuştin, jin jî dîl hatin giritin û zarok bûne xulamên dagirkeran di riya êrîşên hovane yên di bin navê belavkirina ola Îslamê de pêk hat. Êrîş an jî (xezû) pêk hat û qediya, ev rastiyeke dîrokî ye, ti kes nikare dîrokê vegerîne yan jî biguhere. Ew mijareke borî ye, lê em dikarin navê rast lê bikin; êrîş êrîş e nabe ez weke "Fetih" bi nav bikin an jî ez razîbûna xwe derbarê kesên êrîşkar de; nîşan bidim. Ji mafê min e ku ez ji kurê xwe re vê rastiyê şîrove bike, ji mafê min e ku ez rastiya dîroka xwe û neheqiya ku li ser bapîrên min pêk hatiye; binivîsim. Her wiha ez belge bikim da ku careke din dubare nebe, yan jî bi mebesta sererastkirina xeta dîrokê ya ku di wê demê de li dijî gelê min bû. Dîrok dibêje ku ji xîlafeta Umer bin Elxetab ta dawiya xîlafeta Osmanî şer û pevçûn di navbera Kurdan û wan xîlafetan de berdewam bû, her tim Kurdan serhildan diqewimandin û rojeke xweş nedîtin. Lê ev mijar baş nehatiye destnîşankirin. Komkujî berdewam e ji Umer ta Erdoxan di bin siya ola dagirkeran de, lê hê jî sedem û encam li ber çavan nehatiye derbaskirin. Ji wisa dûrtir jî gelek kurd ji bo serkêşên dagirkerên dîrokên dua dikin û wiha dibêjin (xwedê ji wan razî be)! Ew kesên ku pêwîst e werin darizandin bi taybet li dadgehên mafên mirovan. Ji ber vê yekê hêviyeke gelê me heye ku pêşengên wî, rewşenbîrên wî û dîroknasên wî; xwe hilavêjin û ji serdema bêdengiyê derkevin. Hilavtin gaveke girîng e di vê qonaxê de. Çimkî derfet li pêşiya me vekirî ye. Pêwîst e em ji rewşa bêdengî rizgar bibin, em hemû komkujiyan û êrîşan bi nav bikin, ji ber ku dema tu bi nav dike kîna dilan jî ji holê radibe û rê li pêşiya pêşerojeke nû vedibe.

Reva Zarokan Ji Dibistanê.. Sedem û Çare

Qadir Egîd

Reva ji dibistanê leçbûn û xwariyek di reftarê (silûk) zarokan de ye, ku ew zarok bê sedem û egerên berbiçav, bê haydariya dê û bav, bê sedemin diyar , û bê rêdan û izn ji hêla rêveberiya dibistanê ve naçe xwendin û dibistanê xwe ye.
Gelek sedemin civakî, derûnî, û ta aborî jî hene, ku dihêle ev rewş li gel zarokan derkevin hole. Divê malbat di qonaxa destpêkî de, dema ku zarok diçe refa yekê ji xwendinê guhdariyê li vê yekê bike, ew ji jiyanekê diçe jiyaneke dî, jîngehek nû, kesayetin nû "berî hevaltî çêbibe", miroveke nû bi navê mamoste, û demên dirêj ji rûnişina li ser kursiyan, û ya herî balkêş zimanekî nû. Lê piştî ku rêbaza kurdî derbas bûye dibistanan dibe ev sedem hindekî sivik bûbe.
Zarokin hene, ji koka xwe ve newêrek in, dema ku diçin vê jîngeha nû, rastî pirsgirêkin derûnî "nefsî" dibin, û ew tirseke mezin li gel wan diafirîne, nexasim tirsa lêdanê ji hêla zarokên şûm û zexel, lewre ta ku jê were wê sedem û behaneya bo neçûnê biafirîne, û dibe ku li xwe û tirs û newêrekbûna xwe ji dê û bavê xwe re mikur were.
Zarokê ku "delalî" be û pir bi dê bavê xwe ve girêdayî be, ne hêsan e ku zû bi zû xwe ji wan berde û qebûl bike ku here dibistanê.
Gelek caran ev pirsgirêk bi zarokan re bê sedem û ji nişkave derdikeve holê, sibeha ji xew radibe û bi serê xwe yan zikê xwe digre, û bi behaneya êşa wan xwe di nav livîna de dihêle, gelek caran jî dibe ku xwe verşîne yan madê xwe bixelîne. Li vir dê û bav dikevin heyrekê de, û wî wê rojê li mal dihêlin. Lê piştî çend kêlîkan ew nexweşî ji derdorê diçe, û dibe kesek normal. Eger ev fen û fût di ser dê û bav re derbas bibin, wê ew zarok rojeke dî, û yek dîtir jî van hewldanan zexel bike.
Carinan nejîhatîbûna zarokan û tirsa wan ji cezaya mamosteyê wan jî dibe sedema neçûnê. Ev rewş jî pir zarok gazinan jê dikin, û sedema wê jî ew e, mamoste ne, mamosteyên ku zarokan li dibistanê bi awayekî tund û tûj ceza dikin, mîna ku wan demin dirêj li ber hêt disekinînin, her dû dest û lingek wan hildayî be, yan bi kenarê darê lêdanê li pişta destên wan û serê tiliyên wan didin, yan jî hindek caran bi daran li lingê wan didin (feleqe). Ji xwe ev yek jî vediger neperwerdekirina mamosteyan bi awayekî zanistî û pispor.
Gelek encamê reva zarokan ji mdibistanê hene, ji wan derngmayîna zarokan di xwndinê de, fêrbûna tiştin kirêt ji hevalê neqenc, herweha fêrbûna derewan û nebaweriya zarokan bi kesayetiya xwe ku hino hino qels dibe ta ku dighêje astekê wenda dibe.
Lê ta ku dê û bav bikaribin vê diyardeyê bidawî bikin, yan bi kêmanî encamên wê li ser zarokan sivik bikin, divê bi hindek gavan rabin, mîna fêrkirina zarokan berî derbasbûna dibistanê, anku hindekî ji wan re li ser dibistanê biaxivin, û ne derd e eger serdanekê yan didwan bo dibistanê pêk bînin, û jê re li ser biaxive. Ya herî giring di vê qonaxê de ku zarok herin dayîngehan"rewda" ji ber ew nimûneyek biçûk ji dibistanê ye.
Piştî çûna zarokan ji dibistanê re, pir giring e ku serdanin berdewam ji hêla dê û bav re lê hebe, ta ku rewşa kurê xwe ji hêla xwendin û derûnî bişopînin.
Gerek e di qonaxa pêşî de ji sala xwendinê bav kurê xwe bibe û bîne dibistanê, û her êvar li gel rûne, pirsa xwendinê jê bike, alîkariya wî bi awayekî nerm û li gor têgiştina zarokan bike, û nav tê bide ta jê hez bike, herweha merov dikare jê re behsa giringiya xwendinê ji bo pêşerojê bike, û eger xwendina xwe berdewam bike wê çawa bibe tiştek xwedî şan di nav civaka xwe de, lê bi awyekî hêsan û bi gotinin nêzîkî mejî û hişê wî, û ta ji merov were dûrî gotinên qelew û zehmet bikev .
Eger merov bixwaze zarok gelekî ji dibistanê hez bike, wê diyarî û xelat pir di vê yekê de alîkar bin, û nexasim ger sozin bo derketina gulîstan û sûkê û kirîna lîstikin nû pê re hebin.
Ji hêleke dî ve, erkrk li ser rêveberiya dibistanan dikeve, divê ew di destpêka sala nû de, ahengekê ji bo zarokên dibostanê lidar bixe, dibistanê bi wêne, û tiştên ku zarok ji wan hez dikin bixemilin, ta ku bala zarokan bikişînin.
Gerek e dê û bav ji rewşin wisa bêtirs bin, û ta ji wan were li vê diyardeyê ne weke nexweşiyekê binêrin, vajî wilo, ew dikarin danustendinê pê re ji qurçikek taybet bikin, û bihêlin ku ew bibe sedema hezkirina û girêdana zarokan bi dibistanê ve

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelali

Rojnameya "Bûyerpress" Weşana Dosiya Kuştara Malbata Remezanê Kabreş Bidawî Kir (6-6)

- Remezan hinkî xwe bi şûn de da û destê xwe avête demancê lê beriya ku Remezan demancê derxe hevalê ku bi min re bûn li Remezan reşandin û ew kuştin.

De ka werin ez û we bi hev re em ê ji Yûsiv bavê Hemze bipirsin ka ew ê çi ji me re li ser vê kuştara winda bêje, ka kujer kî bûn, nemaze ji ber ku ew kuştar li dijî partiyek siyasî çêbûye. Û Yûsiv bavê Hemze yek ji hevalê partiya Kawa bû di wê demê de wek ku ew dibêje û şeva kuştarê di nav wan debû lê ji kuştarê filitî. Hisên (Şibqelî) ew bi vî navî li cem hevalên xwe dihate naskirin, û Mihemed Emîn Xoce ew jî li cem hevalên xwe bi vî navî dihate naskirin Remezan ê Kabreş ka ev mirovin çawa bûn kî bûn.?

ji k bûn ji bo çi, li ser çi hatin kuştin bi wî rengî.?

Yûsiv bavê Hemze yek ji bermayên wê ku ştarê ye. Awirên çavê wî qermîçonkên rûyê wî sed pirs û pirsên bê bersiv dikin ji vê dîroka ve şartî… Yûsiv yekî ne kine û ne dirêj e, yekî esmerî nîşanên kul û xem û derda li ser rûyê wî xuyadikin.. Qermîçonkên eniya wî dibêjin ev mirov pir westiya ye di jiyanê de, ketiye, rabûye, bazdaye, li çol û çiya razaye, birîndar bûye, birçî maye, xwe veşartiye.. hertişt di çavên wî re xuya ye. Barek giran li ser milê wî ye milê wî di bin de tewaye, ne dadixe û nejî dikare hilgirê bi tena xwe li wê navê maye û bar maye daleqandî Yûsiv di binde diçe û tê. gelo wê kengî vî barî daxê yan wê hilgirê, ew jî nizane ka wê kengî daxê yan ka wê kengî hilgirê, li gor ku ew didê xuyakirin.. Barê wî giran e, destê wî teng e, rê û rêbar li pêşiya wî hatine girtin, lê belê di dilê wî de gemiyek ji kul û xema heye. Lê beriya ku em herin cem Yûsiv em jê bipirsin em ê binêrin gelo ka çi tê gotin û çi hatiye gotin di derbarê wê kuştarê de li gundê Cirnikê û li ser zimanê hin kesê ku peywendiyên wan bi mala Remezanê Kabreş re hebûn...

Bavê Ebdilbaqî yek ji cîranê mala Kabreş bû. ew dibêje çaxê ku min dengê gula kir di wê şeva ba û baran û bandev de min xwest ez nas bikim ka ev çi gule ne hema bêje xaniyê min di rex yê mala Kabreş debû û dengê gula ji nîzîk dihat... ez derketim hewşê min roniya hewşê jî vêxist lê derketina ku ez derketim gulek di ser serê min re hat li raserî deriyê me yê eywanê ket li wê roniya ku di ser deriyê eywanê re ket ez di cî de bi şûn de vegeryam mal, min roniya hewşê jî vemiran bê ku ez bizanibin ew gule ji ku hat yan ew kî ne… ez matmayî mam ji ber ku gule gelek dihatin berdan, û di wê baranê de ew dem ne dema daweta bû, û divê baranê de ev gule têne berdan hilbet ne ji xwede ye.. ez şaşo maşo bûm tirs kete dilê min ji lewma ez di cî de vegeryame xênî min deriyê xwe girt bê ku ez ji maliyê xwe re jî bêjim lê ma di dil min de ka ev çibû...

Di wê dem êde bihîstok (têlefûn) nebûn ku yek ji derdorê xwe bipirse ka ev çi ye... Ebdilbaqî ma li ber sopa xwe û cîranê wî hatin kuştin bi erzanî?

Yekê dî, ew jî cîranê wan bû ew jî li gor gontina hine kesê gundî wisa min ji devê wa girtiye. lê mixabin ez navê wî nizanim mirovekî navser bû digotin ew ji gundê Şekirxaçê bû li hêla Dêrikê. Ew di wê baran û bandevê de li pey dengê gula tê ta ku dikeve hewşa mala Kabreş de… yekî ji êrîşkera wî dibîne ji şûn ve diçe tivingê dixin di serê wî de jê re dibêjin tu kî yî ji min re bêje beriya ku ez te bikujim, û kî ji te re gotiye were vir…!?

Yê navser got: Ez cîranê wa me, min dengê gula kir, ez hatim min xwest ez nas bikim ka ev çi ye.?

yê êrîşker jê re dibêje di rêya xwe re vegere ne te em dîtîn û ne me tu dîtî beriya ku ez te bidim ber gula.?

yê navser jê re dibêje: Birazî xêr e ev çi heye ev kî ne û çi dikin?

yê êrîşker jê re dibêje ev ne karê te ye ez ji te re dibêjim bi şûn de vegere, ev ne karê te ye, tu deng bikî ez ê te jî bidim ser wan, yela ji vir here rast here mala xwe û tu ji kesî re bêje tu jî were kuştin?

yê navser bi şûn de vegeriya mala xwe bê deng, lê kalo ma behitî ji kuştarê û qîreqîra pîrek û zarezara zarokan nalenala birîndara û ew nikare tiştekî ji wan re bike li ber çavê wî cîranê wî têne kuştin… Tevzînok bi giyanê wî de hatin, giyanê wî hemû li hev ket, jiyan di çavê wî de tarî bû xew lê herimî, nema dikarî razê, ji êvarî ta fecra Xwedê ew xitiyar maye şiyar… Bi hilata rojê re kalo berê xwe daye gundê Şekirxaçê yê ku ew berê jê hatiye. dibêjin bi rê de felc bi kalo re çêbûye û çû ser dilovaniya Xwedê ji tirs û qehra wê kuştarê re.

Yekî dî ew jî xitiyar dema ku ew diçe çav li wan kuştiya dikeve zimanê wî dişkê. dibêjin ew Musilman ma lal ta ku ew jî çû ser dilovaniya Xwedê. Hinê dî digotin: Rijîma Tirkî bi rengekî fermî hatin ew kuştin û vegeriyan. Hina digotin: Na teleba ew kuştine ji ber ku mala Kabreş alîkariya rijîma Tirka dikirin.

Bi rastî bi seda çîrok û çîvanok li ser vê kuştarê hatin gotin her yekî ji xwe re tiştek digot bê ku yek li pey vê kuştarê bikeve û rastiya wê derxe… dibêjin dema ga dikeve kêr pir dibin. Bi rastî ev kuştar ne hindik bû hijde mirov ji pîrek û zilama û zaroka hatin kuştin û nexasim mêvanê mala Kabreş tev şoreşger bûn, hevalê periyek dijberî hikumeta Tirkî derketibûn… gelo ma hijde mirov di destpêka şevê de li gundekî li ser sînor werin kuştin wê ne bi rengekî fermî ji rijîmê hatibin kuştin.?

Behrem ew jî yek ji cîranê wan bû piraniya şevê xwe li cem mala Kabreş dibûrandin… Tim diçû şevbuhêrkê xwe li mala wan dikirin ji xwe re dilîstin ji xwe re daxivîn Remezan ji wan re ji aş û bajar tanî.. Wê şevê jî wek her şev xwe kar dike ku here civatê li mala Remezan û piraniya şeva mêvanê mala Kabreş hebûn û civata wan xweş bû, ji lewma yê weka Behrem xwe li wan digirtin, wê êvarê jî wî xwe kar kir da ku here civatê, lê piştî ku Behrem derdikeve derê xênî li hewşê dimeyzîne ê çi bibîne baran ji erd û ezman tê ji maliyê xwe re dibêje: Bi Xwedê îşev ez naçim, tofan e, ez nikarim herim û vedigere li ber sopa xwe di nav zarokên xwe de rûnê.

Bavê Şewqî yek ji qaçaxçiyên kevn e… wî û Remezan ê Kabreş ev kar istin. Remezan hinkî xwe bi şûn de da û destê xwe avête demancê lê beriya ku Remezan demancê derxe hevalê ku bi min re bûn li Remezan reşandin û ew kuştin. bavê Şewqî dibêje di dema kuştarê de ez bi xwe wê çaxê li Serxetê bûm… ez jî qaçaxçî bûm û peywendiyê min bi piraniya qaçaxçî û partiyên kurdê Bakurî Kurdistanê re hebûn û di wê demê de hina ev kuştar xiste sitûyê PKK de. Peywendiyê min wê çaxê bi PKK re pir xweş bûn, û dema ku ew kuştar çêbûn hevalê PKK pir aciz bûn li ser vê kuştarê û xwestin serxweş Kemal bikujin. Wê demê wek niha destê PKK ne dirêj bû. wê çaxê xelkê wisa hesab ji PKK nedikirin ji ber ew bi xwe jî ne wek niha li diniyayê bela nebibûn... Di baweriya min de heger ku bi destê PKK derketiba wê serxweş Kemal û hevalê wî bikuştan... piştî ku serxweş Kemal seh kir ku wê PKK wî bikujin wî baz da, çû xwe da Enqera û Sitembolê demek dirêj ew î xwe li wan deran veşart.. tevlî ku serxweş Kemal bi rengekê fermî bi rijîmê ve girêdayî Ergenekon bû. Li gor ku bavê Şewqî ji min re got: serxweş Kemal û nûnerê Sofika xwendevanê yek dibistanê bûn,

gelek caran bi hev re kirine ew dibêje: Ser xweş Kemal ji min re got, çaxê ku me bi ser mala Kabreş de girt. min bang kire Remezanê Kabreş û min Remezan derxiste hewşê min jê re got: Em hatine tê wa mêvanê li cem xwe bide me ne me tu dîtî ne te em dîtîn? Dibêje Remezanê Kabreş ji min re got: Ma te dîtiye kesî mêvanên xwe radestî dijminê wî de...! ma ez ê çawa mêvanê xwe bidim te. çi min ew dane te û çi min ew kuştin ma newek hev e ji ber ez dizanim hûnê wa bikujin. ev xiyanet e û ez tucarî mêvanê xwe nadim we. Wa xwe bi min girtiye we dîtiya kesî xwegirtiyê xwe radestî dijminê wî kiriye?

Bavê Şewqî dibêje ser xweş Kemal ji min re got: Yek ji Remezan yek ji min me tiştek bi guhê hev nexew heval bûn ew hevaltî bi xwe jî di rêya rijîmê re bû ez vê baş dizanim…ev zilam bi xwe li ser du werîsa dilîst li Serxetê û li Binxetê) Bavê Şewqî dibêje çend cara serxweş Kemal xwest min jî bikuje, lê bi destê wî derneket ji ber ku ez jî têra xwe hebûm.

Niha gotin ya Yûsiv bavê Hemze ye ew ê baxive:, ez hevalek ji hevalên partiya Kawa bûm û di wê demê de û ta vê gavê jî ez xwe dibînim yek ji endamê partiya Kawa…Bi rastî di wê demê de wek hûn dizanin nakokîyek xerab û pir zor di nava civaka Kurd de hebû. ew nakokî bi xwe hin bi destê dijmin bûn û hin jî ji nezaniya me bû ev jî vê dawiyê me zanî ku ev yek heye.Û ji bilî kesên ku alîkar bûn bi Conta re ji malbatên kurda yên xuya nexasim yên ku sûde dikirin ji wê rewşê… ji lewma bi qasî ku me şerê hev dikir û me ji hev dikuşt me şerê dijminê xwe nedikir… hina ji me digotin, em ê pêşî xwe bi xwe ji hev safî bikin.! Da ku em ji dijmin re vala bibin! me qirik û gewrî li hev ziwa dikirin me berê xwe pir fireh kirbû em nû ji xewek kûr û dirêj û giran rabibûn.. mane hûn dizanin ku piştî Şoreşa Şêx Seîd û Agirî û Seîd Riza kurd ketibûn xewek giran. ji lewma ez dibêjim em nû bi siyasetê ketibûn ji me we bû ku em ê di şev û roje kî de Kurdistanê Azad bikin. Ji ber vê yekê jî me tu pakî ji dijmin nedikir û dijmin jî pir xwe serê xwe bi me nedêşand lê ji me weye ku ew ji me ditirse lê tu nebê ew ê bi sedê kelem û davikan li pêşiya me datîne bê ku em ha jê hebin me ji xwe re digot: Rijîm îro qels e ew nikare bi me re deyîn bike.. me ji hev re digot: îro roj roja me ye lê wek min ji we re got, bi qasî ku em bi hev mijûl dibûn em hewqasî bi dijmin ve mijol nedibûn. binêrin ez ê tiştekî ji we re bêjim bi me re giha wê qunaxê, yê ku ne wek me biramiya me digot ev zilamê Kemalîzma ye û her yekî ji me wisa li ser yê dî digot. Mixabin me bi sedan ji hev dikuştin, me binê erdê Kurdistanê ji hev dagirt ji kure mêran… Û ev Markisî ye û yê dî ne Markisî ye û yê dî Mawî ye û ne Mawî ye û yê dî Tirotiskî ye û yê dî berciwazî ye, û yê dî xwe firotiye. Partiyên me Markisî bûn û her yekî ji yê dî re digot: We bi rengekî şaş rahiştiye Ramanên Markisî em ji we rasttir in, em li ser va çîroka diketin qirik û gewriyê hev ka kî dikare me bisekinîne, em di rewşek pir xirab re dibûrin.. Me nedizanî ku destê hikumetê di nav me de dirêj e ew me berdide hev û ji xwe re li me guhdar dike..!?

îca em werin babetê xwe yê girin beriya kuştarê bi demakî nûnerê me yê herêma Bota mamoste Mihemed Emîn Xoce. Li gundê Tilminarê mamoste bû ew Xalibo, Xalibo bi xwe wek nîv muxtarekî li xwe dimeyzand dikevin gengeşê li ser doza kurdî û di wê genge şê de hev aciz dikin, Xalibo sixêfa dike kurd û Kurdistan û nemirê kurda nexasim Leyla Qasim... Piştî ku Xalibo sixêfa dike Leyla Qasim û pirsa kurdî û serokê partiyên kurdî gengeşe disekine her yek bi rêya xwe de çû. Lê Mihemed Emîn bi van sixêfan tengjî pir adiz bû û ji xwe re got: kesê ku sixêfa bike pakrewan û serok û partiyên kurd gerek ew were kuştin, ew nemîne sax û ji hevala re got: Divê hûn Xalibo bikujin.?! Hevalan jî ataxî li Xalibo girtin ta ku rojekî ew û yek ji mirovên wî li bajarê Nisêbînê dîtin û di bazarê de li wan reşandin herdû kuştin. Malbata Xalibo zengîn bûn, sê gundê wa hebûn, û destê wan jî di hikumetê de dirêj bû.. Birayê Xalibo nîv melyon wereqê hingî dane Feqe Hisên da ku ataxiyê li hevalê me bigrê.

Pirs: bibûre Feqe Hisên kî ye ji ku derê ye..?

Bersiv: Feqe Hisên ji eşîra Hêtirekiya ye ew jî ji wan gundê dora me bû, ew tim di nav me de diçû û dihat û karin sivik jî ji me re dikirin, ew ne heval bû lê piraniya tiştê me dizanîbûn, ez dikarim ji te re bêjim ku tiştek jê nedihat veşartin. Ji lewma birayê Xalibo pere danê jê re got, tê ataxiyê li wan bigre. Dibe ku Feqe Hisên hevalê hikumetê jî be, lê me nezanîbû. Xuya dike wan dizanî ku ne ew bê kesek nikare ataxiyê li hevalê me bigre. Ji ber ku tim û tim bi hevalan re bû û baweriya hevalên me pê dihat. piştî ku ew tola xwe hilînin wê nîv melyonê dî jî bidin Feqe Hisên…. Me çîroka Xalibo jibîr kir em karê xwe dikin hevrikî zore kî ji me haj Feqe Hisên û ataxiyê hebû. Ez yekim, min tucarî bîra Feqe Hisên ku dijminatiya me bike nedibir. ew di nav hevalên me de diçû û dihat, lê ma hevalan ji ku dizanî wî xwe firotiye malbata Xalibo ji bo melyonekî!?

Ji me we bû ku ew alîkariya me dike, dem derbas bû û Kinhan Êvrên bû Serokê Dewletê û dest bi girtinê kir, çi kesê ku di siyasetê de dixebitî hikumetê destê xwe avêtiyê yê ku hate girtin ji xwe ew avêtin binê zindanan û yê dî wek ku mirov destê xwe tijî nok bike û li kevirekî bixe her yek ji me bi cihekî de baz 0da.

Hevalên hemû partiyan bi dehan binxet bûn hevalên me jî wek hevalên van partiyan binxet bûn Feqe Hisên jî bi hevalên me re binxet bû û hina dibe û hina tîne bê ku em zanibin ya dilê wî çi ye.

Remezanê Kabreş jî qaçaxiya çeka dikirin û ji berî bazdanê hevalên me ew nas dikirin, ji lewma dema ku hevalên me ji Serxetê bazdan çûne mala Remezanê Kabreş û Feqe Hisên jî bi hevalan re çûye wê derê û vegeraye Serxetê wek hemû hevala… yê min ez bi xwe tucarî neçûbûm mala Remezanê Kabreş lê hevalan ji min re digotin, Remezan mirovekî hêja ye û gelek caran li ber min axivtin li ser wî û zarokên wî çêdibû bi qencî… Di wê dema ku hevalan baz dan min xwest ku ez ji xwe re qaçaxiyê bikim..

Pirs: bibûre te yê qaçaxî ji xwe re bikira yan ji partiya xwe re.?
Bersiv: na min ê ji xwe re kirba, ji ber ku min dî rewşek nû hate welêt û Welat hate valakirin min ji xwe

re got: ez naçim Ewropa ji ber bi seda ji hemî partiya berê xwe Ewropa lê min ji xwe re ez ê li welêt bimînim û ez bazdayî me ji hikumetê çima ez ê vî karî nekim em binêrin ka berê me li ku ye.?! Ji lewma min xwest ez vî karî bikim û ez derketim çiya, li çiyê min Şikrî û yekê dî ez nizanim navê wî çibû nas kirin û em çend roja li wan çiya bi hev re man… ew çiya asê ne, mirov bi salan dikare li wan bimîne hikumet nikare mirov bigre, lê em çûne ji bo qaçaxiyê em şevekê li vî gundî ne şeva dî li gundê dî ne û bi roj em xwe didin çiya.. hûn dizanin karê qaçaxiyê çawa ye..! Piştî çend rojan em man li wan çiyan, rojekê me xwe berda, em çûn li gundê Girefê bûne mêvan êvara dî me berê xwe da gundê Rûta li binxetê, wê şevê jî em li gundê Rûta man li mala yekî Xiristanî, roja dî me berê xwe da Qamişlo…. Tu nebê birayê min û hin hevalên dî ew jî di Nisêbînê re binxet bûne lê ez nizanim.
Pirs: ew heval çûbûn çi?
Bersiv: min nedizanî ji bo çi daketine biniya xetê.
Pirs: birayê te jî hevalê Partiya Kawa bû?
Bersiv: belê ew jî heval bû, dema ku em gihane bajarê Qamişlo Şikriyê Kabreş gote min em ê herin mala me çayekî vexwin xwe rehet bikin û bi rêya xwe de here… Min ji Şikrî re got: na ez ê herim, carek dî ku Xwedê bêje erê ez ê werim, lê Şikrî bela xwe ji min venekir û bi zorê ez bi xwe re birim, dema ku em çûn mala wa min dî vaye birayê min û neh deh hevalên dî li wir in, ez behitî mam, ji wan, Sikirtêrê me yê giştî Şibqelî jî li wir e. (ev navê wî yê tevgerî bû) wekî dî navê wî Hisên bû û jina wî jî pê re bû û nûnerê me yê herêma Bota Mihemed Emîn Xoce û yên dî min ew nas nedikirin
Pirs: ev hevalên we tevlî sikirtêr hatibûn çi?
Bersiv: wan jî ji ber hikumeta Conta Tirka baz dabûn dixwestin di Sûrî re herine Ewropa.
Pirs: te dizanîbû ew ê herin Ewropa?
Bersiv: na min nedizanî, lê li mala Remezanê Kabreş ji min re gotin: em hatine em ê ji vir herin Ewropa.
Pirs: ev biriyar ji partiya we hatibû sitandin ji bo derketina Ewropa yan biriyar kesayetî bû.?
Bersiv: bi rastî ez vê nizanim ji ber ku em ji hev bela wela bibûn û heger ku serokatiyê biriyar dabe ji bo derketinê lê min nebihîstibû.
Pirs: ma naxwe biriyar kesayetî bû.?
Bersiv: na ez ne bi vî rengî lê dimeyzînim, min ji te re got: wek çêlî kewa li me hatibû em ji hev belawela bibûn, wê çawa biriyar hatiban sitandin. piştî ku min silav li hevalan kir ez rûniştim em ser rewşa Kurdistan û Tirkiyê ya nû axivîn, nexasim min ji demek dirêj de hevalên berpirsiyar nedîtibûn em man ta ber êvarê min ji hevalan re got: ez ê rabim herim û di wê demê de baranê ji erd û ezman dayê, mirov nedikarî ser ê xwe ji xênî derxe.
Pirs: hûn çend hevalbûn li wir?
Bersiv: bawer bike ez nizanim em çend bûn, çimkî hin ji wan hevalan ew cara pêşîbû ez wa dibînim min nas nedikirin lê bi gomana min em li dora deh kesa bûn wê şevê.!?
Pirs: tu dibêjî çûn û hatin li mala Kabreş gelek hebû yanî hinê dî hebûn ew ji wir çûn û hin hatin wir di wan rojê ku tu li wir.?!
Bersiv: ma ez wê êvarê gihabûm mala Kabreş ew jî Şikrî ez bi xwe re birim, min nedît ne kes hat û nejî kes çû ji wan kesê li wir pê ve, çimkî baran ji erd û ezman dihat.. roja sisêyan katijmêr heştê êvarî em li dora sopê rûniştîbûn mamoste Hisên û Mihemed Emîn ji me re daxivîn li ser rewşa kurdî a kevin û nû û

nexasim piştî hatina Kinhan Êvrên. Dîtina me dîtî gule li me barîn wek baranê, bi rastî em behitî man, em şaşo maşo bûn me got: ev çi ye, ev di ku re hatin.!? qêrînî bi xênî ket, pîrek û zarok, ez çi ji te re bêjim, bi rastî ew şev nayê pesindan, kuştina zarokan, kuştina pîrekan, ma ez ê çi bêjim xuya dike dilê wan bi guleyan hînik nebû, mayîn di pencerê re avêtin xênî, agir bi xênî xistin ,xanî bi ser me de dane erdê.
Pirs: ma hûn destevala bûn yanî çekê we ne li cem we bûn?
Bersiv: na çek bi me re nebûn, em deste vala bûn, lê ma kê dikarîbû serê xwe rake û destê xwe bavêje çekê xwe ta ku çekê me bi me re jî bana, bêgoman wê ne li wê odê ban ez bi rastî ji te re bêjim em şevekurî kirin ,me nema dizanî ku gule ji ku ve têne me.
Pirs: tu wa nas dikî?
Bersiv: na destpêkê min nedizanî ew kî ne, lê vê dawiyê min tev nas kirin, yek bi yek û navê wan jî ev in: Çeko û Hevo û Hejo, ev her sê birayê Silo bûn û Berhîmê Xezo û Çetîno ev ne tiştekî Silo bûn, dibe ku ew bi pera bi wan re hatibin ew ji gundê.. bûn (Birahîmê Xezo çûbû Hecê yanî zilam Hecî bû) serxweş Kemal û Mircano ev kurê xalê Silo bûn. Çetîno û Hemo ketibûn derê Eywanê û direşandin û her pêncê dî mabûn li hewşê û di pencerê re direşandin… ez bawer im guleya pêşî bû li min ket, xanî li me wek roja reş lêhat, me nema zanîbû em ê çi bikin li ser serê me bû dû û dûman… Binêre



heft mirov me gulebaran dikin û em di xênî de ne, û xanî tarî ye û em ji malê biyanin rê û rêbarî li ber me girtine, ka em ê çi bikin, dido ketine eywanê û pênc li hewşê ne, em nikarin xwe biqeliqînin..
Pirs: te got baran ji erd û ezmana dihat wek lûlika misîn ma ew çawa gihane cem we di wê baranê de gelo cilê wan şil bûn yan na?
Bersiv: min xweşik ew dîtin, vaye ez navê wan yek bi yek ji te re dibêjim, nemaze piştî ku ez birîndarbûm û min xwe avêt qubala cihnivîna, qubalejî li ber derîbû. Ser xweş Kemal jî derbasî Eywanê bû di navbera min û wî de nîv mitir nebû… Min dikarî bû ez tivinga wî jê bistînim, lê min ji xwe re got: dema ku ez tivinga wî jê bistînim û wî bikujim wê ew min bibînin û min bikujin, ji ber ku min nikarî bû ez xwe li ser xwe bigrim, gule li lingê min ketibû... Bawer bike heger ku ez ne ji lingê xwe birîndar bama min dikarî ez tivinga wî jê bistînim û wî bikujim.

kumetê rê ji wan re vekirbû û ew di Gir Hesin re derbasî binxetê kirbûn, û ew li malin nêzîkî mala Kabreş rûniştibûn ta ku li wan bû şev ji nûv re hatin… Ez bawer nakim ku di wê baranê de kes karibe ji mala xwe here mala cîranê xwe, hingî baran dihat ji erd û ezman û bayê kur pê re dihat, mû ji mara dikir, ma rast e ew ji Serxetê di bin wê baran de hatibûn û cilê wan ziwa bimînin ez nikarim vê bawer bikim?
Pirs: tu dibêjî piştre te nas kir ku ew bi roj binxet bibûn yanî hikumeta Tirkî û ya Sûrî ew derbas kirbûn, baş e, te ji ku ev tişt nas kirin.?!
Bersiv: min ji dostê xwe nas kirin li Serxetê û li binxetê. Ji bîr neke ku min demak dirêj qaçaxî kiriye ez va meselê wisa baş dizanim.?!
Pirs: baş e, gelo çima mala Kabreş hatin kuştin ma ya wan çibû?!
Bersiv: di baweriya min de tiştekî wan bi mala kabreş re nebû, tenê çima hevalên me li mala wa bûn ew ji bo vê yekê hatin kuştin.
Pirs: te got, min dengê wan dikir, ji lewma ez dibêjim min xweşik ew dît û min dengê wan dikir çi ji hev re digotin, ji vê yekê min baş dêna xwe da cilê wan cilê wan ziwa bûn min zanî ku ew gelekî di bin baranê de nemeşîne.
Pirs: mebesta te jê çi ye, tu dibêjî ew gelekî di bin baranê de nemeşîne!?
Bersiv: ez ê ji te re bêjim mebesta min çi ye… ew ji zû de ji Serxetê hatibûn û ez dibêjim ew hatibûn malin nêzîkî mala Kabreş, hîn bi roj, ji lewma dema ku ew hatin cilê wan ne şil bûn… Û vê dawiyê min nas kir ku ew hîn roj daketebûn hiew dihate naskirin ji wan we ye ku ezi m, ji ber wilo jî laşê wî birin Serxetê, lê vê dawiyê malbata min bihîstin ku ez sax im û ew Şikrî bû.
Pirs: kes ji mala Remezan ê Kabreş filitî?
Bersiv: belê yê mane sax evin: Welat ew wê dem ê li Serxetê bû, Enwer ew jî wê çaxê li Sûrî li Dêrazorê bû… lê yê ku di mal de bûn mane sax Mêrdesar ew li ser destê diya xwe bû, Newrozê heft salî bû lê Newrozê sê gule lê ketibûn ew jî ma sax, û Şêrînê zaro bû ew jî nehate kuştin… Yanî sê kurê Remezan man û keçik jî wê çaxê bi mêr bû ew li mala mêrê xwe bû… Welat û Enwer û Newrozê û Mêrdesar ev li Ewropa ne, lê ji roja ku Welat çûyî Ewropa hîn ew nehatiye Sûriya û Mêrdesar jî navê xwe guhartiye. Nevê xwe kiriye.. navek dî li xwe kiriye.!
pirs: tu dibêjî çima Welat ji wê rojê de nehatiye Sûrî!?
Bersiv: ez nizanim.
Pirs: ew ê mane sax tu wan nas dikî?
Bersiv: na bi rastî ez wan nas nakim, başe, di wê dema ku li we direşandin çi ji hev re digotin?
Bersiv: serxweş Kemal ji wan re digot bi lez xwe xilas bikin dereng e, divê em derbasî oda bibin û bi heste li nav wan bigerin, yê mabe sax em ê wî temam bikin, divê em kesî sax nehêlin. Di wê demê de dengê çend guleyan ji derveyî hewşê hat û ji wan re gotin: em ê wilo û wilo bi dê û jinê wê bikin, piştî ev deng hat, wan serxweş Kemal ji hevalê xwe got: bi lez em ji hewşê derkevin, lê piştî ku derketin li celdên gund jî hin gule berdan, da kes li pey wan neçe yan şerê wan nekin, nizanim ew gule ji bo çi berdan!?
Pirs: baş e te nizanî ew kî bûn yê gule berdan û sixêf kirine wan!?
Bersiv: na, bi Xwedê min nizanî ew kî bûn, lê vê dawiyê min bihîst hina digot, yê ew gule berdan ew pêşmergeyek ji pêşmergên Mam Celal bû ew ê ku di salên heftêyan de hatîn Sûrî, mala wî li Cirnikê bû wilo digotin?
Pirs: te got Feqe Hisên ataxî li hevalên me digirt, lê wek tê xuyakirin ji gotinên te ataxê wan di gund de jî hebûn tu çi dibêjî li ser vê!?
Bersiv: belê rast e, xuya dike ataxê wan di gund de jî hebûn û zena min çû ser hina, lê piştî ku ez sax bûm û min hêdî hêdî pirsî, ew ê ku min goman dikir ku ew ê ataxî li hevalên me digirtin derket ne ew in lê cardî zena min li hina diquse ji gundiya.
Pirs: çend kes hatin kuştin.
Bersiv: tiştê ez dizanim hijde bûn, yê ku hatîn kuştin neh ji mala Remezanê Kabreş bûn, û neh jî ji hevalên me bûn.
Pirs: hin ji hevalên we mane sax ji bilî te?
Bersiv: belê yek ma sax, lê sî gule lê ketibûn. Welato kurê Remezan ew bir û çû Ewropa jê re digotin Heybet.
Pirs: birayê te jî hate kuştin?
Bersiv: belê birayê min jî hate kuştin û malbata min bihîstibûn ku ez jî hatime kuştin ji ber ku gelek gule li rûyê Şikriyê Kabreş ketibûn nema

lê ez dizanim ku ew li Ewropa ne.
Pirs: baş e, piştî ku serxweş Kemal û hevalê xwe bazdan kî bi we ve hat, hikumet yan gundî, yan herdû bi we ve hatin?
Bersiv: Qasê ku ez li wir, min nedî kes hat ji ber ku piştî wan dev ji me berdan ez ji wir çûm, ez xelkê Serxetê bûm, ez ditirsiyam hikumeta Sûrî were û min bigre, min bide destê Tirka... ji lewma ez ji wir çûm lê min bihîst ku kes bi wan ve neçû ta roja dî, heger ji xwe heger ku gundî bi wan ve biçûna, dibe hin ji wan hebûn birîna wan ne ya mirinê bû, wê bimana sax, lê kes bi wan ve neçû û ew mane li ber wê sermê û xwîn jî gelek ji wan hat ta roj li wan derket, û gundî bi wan ve çûn kes ji wan nemabû.
Pirs: te got ez ji wir çûm, baş e, tu bi ku de çûyî, û çawa te hevalên xwe hiştin di wê rewşê de te dev ji wan berda!?
Bersiv: ez çûme mala keç apa xwe li barjarê Qamişlo wek min ji te re got: ez ji Serxetê bûm, min nedixwest kes min li wir bibîne nemaze hikumet, ji lewma min xwe ji wir da alî.
Pirs: baş e, piştî kuştina serokê we yê giştî û nûnerê herêma Bota we wek partî çi kir?
Bersiv: wek ez dizanim hevalên me qet li ser vê bûyerê nesekinîn, û tu kar jê re nekirin, ji xwe tiştê ku ez dîn kirme ev e; çima hevalên me tola van hevalan hiştin li erd, û kes li ser nesekinî bi carekê tevan berê xwe dane çûne Ewropan berê xwe dane xweşiyê û xwîna zelal xwîna hevlên xwe li şûn xwe de hiştin.
Pirs: hevalê we niha çi dikin?
Bersiv: ez tiştekî li ser hevalên xwe nizanim.
Pirs: ma hîn tu ne hevalê wa yî?
Bersiv: ez hîn xwe dibînim hevalê wan, lê ji wê demê de ez tiştekî li ser wan nizanim, bi ku de çûn, mane nemane bi rastî ne wan li min pirsiye, û ne jî min li wan pirsiye!
Pirs: çima ma qey berdane te ji partiyê, yan te dev ji wan berda!?
Bersiv: na ne min dev ji wan berdaye ,û nejî wan berdaye min, piştî ku ez li Sûrî birîndar bûm, ez demak xweş mam ta ku tenduristiya min baş bû, ez nû vegeriyam Serxetê , piştî ku ez vegeriyam min kes ji hevalên xwe nedît û nejî wan ez dîtim!
Pirs: yanî ne te li wan pirsî û ne wan jî li te pirsî.!?
Bersiv: na mijar ne bi vî rengî ye, min dixwest ku ez wan bibînim û îro jî ez dixwazim, lê wek min ji te re got; piştî demak dirêj ez vegeriyam Serxetê, min li wan pirsî min kes ji wan nasnekir, ew ê ku berê min nas dikirin… Xuya dike yan wan dev ji xebatê berda bû, yan ew çûbûn Ewropa, û yê nû ji,xwe min kes nas nedikir, çimkî piştî dozdehê meha neha sala heştê çi kesê karker, çi kesê ku nêzîkî partiyan ba hikumetê destê xwe avêtiyê, yê hate girtin ji xwe ew birin zindanê yê dî jî wek çêlî kewa lê hatin, her hevalekî me bi derekî ve çû, min nema kes ji wan dît, ji lewma em ji hev qut bûn ta roja îro!
Pirs: baş e, mala Kabreş bi çi gunehî hatin kuştin di nêrîna te de!?
Bersiv: wek ez dizanim tu gunehê wan nebûn, Remezan ê Kabreş mirovekî pir hêja bû, heyfa wî ku ew bi vî rengî hate kuştin, mixabin û sed mixabin..
Pirs: Hisên ji kîjan hêlê bû ji kî gundî bû..
Bersiv: bawer bike ez nizanim ew ji kîjan gundî bû, tenê ez dizanim ew ji dora Diyar Bekir bû.
Pirs: xwendina wî çi bû, hin dibêjin wî li zangoyê xwendibû û diblom di Colociya pê re bû..
Bersiv: bi rastî me di wê demê de tucarî pirsa xwendina hevalên xwe nedikir, dibê ku wisa be lê wek ku min ji te re got, me tucarî ev pirs nedikir, ji ber ku tiştê li cem me girin, em hevalan çêbikin ji bonî hêza me çêbibe û em li her gund û bajarê kurdistanê bela bibin, ev ji me re girin bû, yan ez karim bêjim min wisa ji xwe re digot: Qet me ne dipirsî ka ev heval ji kuye û kevnê wî çawa ye, malbata wî kî ye, xwendina wî çi ye? Ev hemû li cem me ne giring bûn bi qasî ku pirbûna hevala girin bû.
Pirs: başe, zanebûna wî çawa bû wek sikirtêr?
Bersiv: bê pesin, mane va bîst û heft sal di ser kuştina wî re çû ye, lê yek ya Xwedê bêje, Hisên pir zana bû û min hîn yên weke wî nedîtine, ez bawer im yê weka wî bi bînim jî?!
Pirsa: dawî tu di xwazî çi bêjî li ser vê kuştarê.?
Bersiv: ez dikarim bêjim ta ku xwîn di damarê min de hebe ew heval û mala Remezanê Kabreş ji bîra min naçin, lê mixabin tiştek bi destê min ve nehat ku ez karibim tiştekî ji wan re bikim yan tola wan li erdê nehêlim.
Dawiya kuştinek bêguneh.
12-12-1980 Li gundê Cirnikê

Luqman Silêman

Rojnameya Bûyerpress spasiya nivîskar û lêkolîner Luqman Silêman, li ser keda wî di dosya vê kuştara winda de dike.